


Dêbavtî di serdema COVID-19ê de Fêrbûn bi rêya lîstinê

Milyonan zarok debistan li ser wan hatiye girtin û gelek caran hêst dikin ku ji hevtemenên xwe dûr ketine. Ev rênûmayî taybete bi fêrbûna bi rêya lîstinê-tîştêkî weha ku ji hemû temenan re xweş be!

Cureyên lîstinê

- Gelek cureyên lîstinê hene ku xweş in û di heman demê de lîstinên fêrkarî û perwerdeyî ne jî.
- Lîstikên li ser ziman, jîmare, alavên derûdora me, şano û muzîk in, derfeta wê dide zarok bi rêyeke ewle û xweş, tiştan bidozin û guzarîşt li wî bi xwe bikin.



Vegotina çîrokê

- Çîrokek a zarokatiya xwe ji zarokê xwe re vebêje.
- Ji zarokê xwe bixwaze çîrokekî ji te re vebêje.
- Bi hev re çîrokekê saz bikin, bêjin "rojek ji rojan.." û her yek hevokeke nû li çîrokê zêde bike.
- Çîrok yan filmekê dilxwaz weke şanoyê bidin nîşandan - zarokên mezintir dikarin weke derhêner, yê biçûk motive bikin û wî fêrî berpirsariyê bikin.

Alavan Biguherin!

- Alavên rojane yê navmalê, weke melkis û fişçe û paçeyên pakijiyê dikarin bibin kereseyên lîstinê.
- Yek ji wan alavan di nava jûrê deynin û her dema ku kesî fikreyek li ser vî tiştî anî zimên, viya eşkare dike û ji yê din re dibêje ku ev kereke dikare bibe çî.
- Bo nimûne melkisa elektrîkî dikare bibe hesp yan mîkrofon, tew gîtar jî!

Lîstinên livdar


- Livînên govend û semayê li ser stranên ku zarok dixwaze saz bike. Kesê yekem dilve û ew ên din pey wî re dilivin. Her kes dora xwe werdigire daku bibe pêşenga govendê.
- "Şertanê" bikin ka kî di xulekekî de dikare bêhtirîn car destê xwe bigihîne tiliyên piyê xwe, yan rabe û rûnê yan jî bi dora jûrê bizivire.
- Hûn bibin "awêne" yê hevdû-teqlîda derbirîna liv û dengên hevdû bikin. Yek ji we dikare wek kesê yekem dest pê bike û piştê bê guhertin. Yan jî bêtî kesî yekem viya test bikin!
- Lîstina govenda rawestanê: muzîkekê vêxin, yan jî kesek bistrê û hûn jî pêre govendê bikin. Ku muzîk rawesta, gere her kes di çihê xwe de zîq bisekine be. Kesê dawîn ku radiweste, gere bo cara din bibe navbijanê lîstikê (ew bi xwe govendê nake).
- Semaya ajalê: mîna ya jorê ye, lê ku muzîk rawesta, navê ajalekê tîni zimên û her kes divê bibe ew ajal.

Lîstina bîranînê

- Yekem kes dibêje "dema COVID-19 biqede, min dil heye... (mînak: ez ê biçime parkê)".
- Duyem kes li kesê yekem zêde dike, "dema COVID-19 biqede, min dil heye biçime parkê û... (mînak: serdana nêztirîn hevalê xwe bikim)".
- Herkes beşekî dixê ser ewê berî xwe û bi vî awayî jî her tiştên xweş ên piştî dawîna COVID-19ê difikire ku dikare bike.
- Di dahatî de tu dikarî vê biguherîni jî bo her senaryoyekê ku bixwazî (mînak: dema ku ez hevalên xwe dibînim).

Strangotin

- Strangotin ji zarokê te re dibe alîkar daku şiyana wî zimanî geşe bike.
- Stranekê bêjin yan jî bijenin, kesê yekem ku dikare hemû stranê bêje, cara paşî dibe serokê gropê û bi xwe dest pê dike.
- Stranek li ser destûştin yan jî ji hevdûrketina civakî saz bikin. Govend û semayê jî zêde bikin!



Ji bo agahiyên zêdetir, serdana van linkên jêrîn bike:

Rênûmayiyên WHOyê

Rênûmayiyên UNICEFê

Zimanên din

Desteka Belgeyiyê

